

Bi boneya derçûna 100 hejmariya weşna NEWROZê, deslata weşanê ev deqê jêrîn ji hin nivîskarê Kurd yên bi zimanê dê dinivîsin re rêkiribû û emê bersivên wan ji xwendevanên Newrozê re biweşînin.

Ji Dil Hejmara Newroz a 100 Pîroz Dikim

Di destpêkê de, ez sipasiyên xwe ji rêdakşyona rojnameya NEWROZ re pêşkêş dikim û hêviya berdewamiyê ji wan dikim. Bi min xweş e ku ez jî dewla xwe di ava bîra wan rojnameya Newroz de dakim û hin awir û têbîniyên xwe bînim zimên. Li gor şopandina min ji rojnamegeriya kurdî re di nav Kurdên binxetê de, rojnameya Newroz a yekemîn e. Yekemîn e bi temenê xwe ku ev 16 sal in bi berdewamî tete weşandin.. Yekemîn e di zimanê xwe yê resen de.. Di baweriya min de li ser şopa ekola Hawarê dimeşe û zimanekî siyasetê peyda kiriye.. Belê ev rojname nebûye gelêrî, bi tenê di çarçovek rêxistinî û teng de belav dibe.. Rûpelên wê ji çend kesan re vekiriye.. Guhdana wê bi pênuşên nûhatî re kême.. Hem jî dibînim ku, yekemîn rojnameye di nav Kurdên sûriyê de. Li gor vê yekê gerek bi kêmayî her hefte an her 15 rojan carekê bihata weşandin, ne her du heyvan..

Li vir dipirsim: Gelo di pey derçûna 100 hejmarî ji rojnameya NEWROZ û vê buhara azadiyê re ku serê xwe li Sûriyê hildide û wek ku diyare em Kurd netewê duwemîn in di Sûriyê de û pêşiyên me; mîr Celadet Bedirxan gotiye:(Ziman şerta heyînê a pêşîn e..) û Dr. Nûreddîn Zaza gotiye: (Gelî Kurdan! Eger hûn naxwazin ji hev tarûmar û winda bibin, berî her tiştî, bi zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin û bi hevaltî û dostaniya milletên din re pêş ve herin û bi rûmet û serbilind bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin), gelo, wê ji niha û pêve rojnameya Newroz di çî qunaxê re derbas bibe.. Wê bi çî kirasê nû di nav xwendevanan de derkeve..

An wê wek xwe bimîne?! Ka hunê çî mizgîniyê bidin me li gor ku di welat de dibin, di warê çapemeniya Kurdî de û bi taybetî di nûkirina rojnameya Newroz de?

Ji Dil Ez hejmara Newroz a 100 pîroz dikin û bi hêvî me bibe rojnameyek heftname..

Konê Reş

Qamişlo, 07.10.2011

Xebatkarên Hêja Yên Newrozê

Pîrozbahiya salvegera weşana NEWROZa hêja ji kanegeha hestên xoşewistiya dilê xwe dikim.

16 sal in, bi dirêjiya temenê xwe, Newroz pencerek bû mala Kurd ronî dikir û hîna jî ew ronî di îse, û xwendevanên xwe bi per û bask dikirin, ji bo raserî mijarên kurdewariyê jîr û behremend birêsin û herçî giriftên me hene, bi çavên dûrbîn binimîn.

Newrozê, bi mijarên xwe yên curbecur, tepsikek ji meyweyên hemereng pêşkêşî xwendevanên xwe dikir. Bi zimanekî kurdî resen dinivîsand, li gorî rêbaza Celadet diçû , û nivîsandina xwe ber bi zimanekî kurdî yekgirtî ve dibir.

Hêjayî gotinê ye, beşdariya piralî ya Newroz di fêrkirin û belavkirina şeweyên resenî derbirînê, zelal kirin peyvên kurdî paye bilind e, herwisa beşdariya Newrozê di zimanê siyasî de pir balkêş e.

Ji hêla xwe ve, ez destxweşiya hemû karmend, berpirs, rêdakşyon û nivîserên Newrozê dikim û hêviya temenekî serkeftî dirêj ji we û Newrozê re dikim.

Derwêşê Xalib

28/9/2011 Qamishlo

